# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (322):

## Çalkiyin serweriyê yen Turkiyê, dijatiyek li ser sivîlekî, ferzkirina vêrgiyan û qutkirina daran, dizînin

Weke tekezî li ser berdewamiya Turkiyê ji dagîrkirina Herêma Efrînê re, hîna bi dehan ji bargehên wê yên leşkerî, biryargehên wê yên ewlehiyê, dezgeh û saziyên wê yên xizmetguzarî û rêvebiriyê, dibistanên û navendên wê yên olî û çandî çalak in, û herweha jî encûmenên xwecihî yên ku wê li sala 2018an. Z bi nav kirine li dar in; Weha jî Istîxbaratên Turkiyê bi hevaltiya Milîseyên "Asayêşa Sivîl" rêbendên ewletiyê vedinin (Çateriya Gundê Kokanê nimûne ye) û hin Kurdên vegerîne herêma xwe lêpirsîn dikin û digirin, bi ser de jî hebûna biryargehine ewlehiyê û leşkeriyê, nivîsgehên abortiyê û rêbendên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî"!

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Vekirina mizgeftekê:**

Nimûnak din li ser berdewambûna dagîrkirina Turkiyê, li 01.04.2025an. Z, **cîgirên Waliyê "Hetayê" û miftiyê Wîlayeta "Hetayê"** – Turkiyê li rex kesayetin "olî û civakî" û "Mihemed Şêx Reşîd - serokê encûmena xwecihî li Efrînê" li vekirina Mizgefta "Hesen Efendî Qasêm Axa" beşdar bûn, li gorî nûçe û wêneyên ku rûpela fermî ya encûmenê li ser Fêsbokê belav kirine.




**= Ahenga bi boneya "Cejna Serweriya Niştîmanî" ya Turkî:**

Û herweha jî bi boneya "Cejna Serweriya Niştîmanî û Cejna Zarokan" ên ku li Turkiyê -hersal li 23 Avrêlê- weke cejin cî girtine, Amojgeha "**Yûnês Emre**" li nav avahiyên Dibistana Pêşesaziyê li Bajarê Efrînê di bin bi dehan Alên Turkî de çalakiyin li dar xistin, di nav re jî gotinên girêdana nivşekî Sûrî yî nû bi çand û girêdana Turkiyê re.






**= Dijatî li ser sivîlekî:**

Li 16.04.2025an. Z, li orta Bajaroka Şiyê, "**Ebo Hemze**" - berpirsiyarê nivîsgeha ewlehiyê ya Milîseyên "El'sultan Silêman Şah - El'emşat" rabû qurşîn di nav lingên Hemwelatî "**Mistefa Mistefa Cemîl Şêxo** - xelkê bajarokê" re avêtin û lêxist, ji ber ku wî buhaya tevahiya mazota firotiyê daxwaz kir.

**= Dijatiya li ser bijîşkekî:**

Li vê dawiyê li Gundê "Gewenda - Meydana" - Navça Reco, çend malbatên anînde yên dest danîne ser malên xelkê gund ji sala 2018an. Z ve, rabûn derî û pencereyên mane dizîn; Û di vê pêvajoyê de "**Ebo Heyan**" -serkêşekî Milîseyên Feyleq El'şam- jî rabû derî û pencerên vêla Bijîşkê dirana "**Ehmed Mûse Hesen**" vekirin û lêxist û şormorên kêm vê re kirin, ji ber ku li pêşiya dizînê sekinî, û berê jî "Ehmed" pircaran di heftsalên borî de daxwaza vegerandina mala xwe kiribû, lê bê sûd bû, û ji ber wê neçar bû ku berdewam li Bajarê Efrînê rûne.

**= Vêrgiyên "El'hemzat":**

Ta niha nivîsgeha abortiyê ya Milîseyên "Firqit El'hemzat" li N. Reco ferzkirin û wergirtina vêrgiyan ji hemwelatiyên Kurd berdewam dike, bi taybetî jî li Gundên "Kumreşê, Hesen, Qude, herdu Hecîkên Jorin û Jêrin, Etmana, Mûskê, Berbenê, herdu Guliyên Jorin û Jêrin", û ew jî beramberî radestkirina zeviyên zeytûna û malên ên vegerîne, û nûkirina "girêbestên demanê/rêvebirina malmewdanên hemwelatiyên ne li gund", û weke tekezî "**Ebo Leys**" û "**Mihemed Itriyê**" du perçedengên cihê şandin, tê de daxwaz ji xelkê dikin ku tiştê ji wan tê xwestin bikin û yên li ser wan ferzkirî bidin, bi zimanê gef û sozan, bi ser hebûna Amûra "Asayêşa Giştî" ya girêdayî Hikomeya Şamê de li navçe.

**= Qutkirina daran:**

Bi ser berdewambûna qutkirina daristanên îhracê yên li Bajaroka "Qitmê" - N. Şera û hin gundên Cindirêsê mane de, li gorî jêderine xwecihî û hejmarek ji vîdiyoyên li ser alavên hevgîhana civakî belavkirî, qutkirinên hejmarek ji darên zeytûnê jî hatine qutkirin, jê qutkirina bêtirî/100/darî zeytûnê bi piçekî û hinjî bi tevayî li Gundê "Şewarxa" - N. Robariya/Şera, li şev 19.04.2025an. Z, li gorî perçevidiyoya ku hemwelatiyekî gund belav kiriye; Û piştî lêkolînkirina bûyerê, diyar bû ku ew dar ên Hemwelatî "**Beşar Seqîb Se'îd**" û zaroyên birayê wî

yê dilovanber "**Cemal**" in; Û êzing û dîrakên daran li makînên bara têne barkirin û ji aliyê milîseyan ve bo navendên firotinê li hundir B. Efrînê û Parêzgeha Idlibê têne guhestin.







**= Binpêkirinine din:**

- "Emar Ke'iko/Ebo El'cod - serkêşekî Milîseya Firqit El'mu'itesêm" û yê dest daniye ser mala Hemwrlatî "**Xelîl Kemal Hisên**" li Gundê "Qîbarê" - Rojhilatê Bajarê Efrînê ji sala 2018an. Z ve, bê vêrgiyeke diravî mezin razî nabe malê radestî xwediyê wê bike, bi ser daxwazkirina wî li dubarekirî re, û "Xelîl" bi riya vîdiyokê tekez dike ku li 08.02.2025an. Z ew tûşî piroseyeke revandinê û dizîna makîna wî bûye, û ew hewcedarî mala xwe ye û ew nikane vêrgiyê bide.

- Li 15.04.2025an. Z, çekdarekî matorek dutekerî li Bajarê Efrînê dizî, û ew jî ye Hemwrlatî "**Ebdîn Menan Cîco**" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna" ye.

**Berdewambûna dagîrkirina Turkiyê ji Efrînê re û mandina milîseyan, binpêkirinan, neradestkirina malmewdanên xelkê herêmê û venegeradina anîndeyan bo herêmên wan ên resen dihevojîne û zêde dike, û heyameke ne aram û ewle ji bo vegera koçberên zoranê bo cî û warên xwe berdewam dike.**

26.04.2025. Z – 2637. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Vekirina Mizgefta "Hesen Efendî Qasêm Axa" li Bajarê Efrînê, 21.04.2025. Z.

**-** Ahenga Amojgeha "Yûnês Emre" ya bi boneya "Cejna Serweriya Niştîmanî" ya Turkî, 23.04.2025. Z.

**-** Qutkirina darên zeytûnê li Gundê "Şewarxa" li Navça Şera, ji vîdiyoke belavkirî li ser Rûpela "Efrîn El'an", 19.04.2025. Z.

**-** Qutkirina daristaneke îhracê li Bakurê Bajaroka "Qitmê" li Navça Şera, ji perçevîdiyoke ku ragîhêner "Ehmed El'berho", ye ku li 22.04.2025an. Z belav kiriye.